

Daxuyaniyek ji raya giştî re

Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di van demên dawî de rastî êrîşên dewleta Tirk hatin, piştî ku Serokkomarê Tirk gefa dagirkirina herêmê û dagirkirina herêmên din ên Sûriyê xwar û bi dehan sivîl di nav de jin û zarok bûn qurbanîyên van êrîşan.

"Parastina aştî û ewlehiya navneteweyî" û "mafê gelan ji bo çarenivîsa xwe" wekî du armancên herî girîng ên Neteweyên Yekbûyî di Peymana wê ya 1945an de cih girt.

Wek ku di Danezana cîhanî ya Mafên Mirovan de hatiye diyarkirin di sala 1948 de , Di pêşgotina xwe de wiha dibêje: ((Ji ber ku xemsarî û nehiştina mafên mirovan bûye sedema kiryarên hovane yên ku wijdanê mirovî diêşînin, û armanca gelan bigiştî peydabûna cîhanek e ku tê de ferd ji azadiya ramanê sûd werdigire. û bawerî û ji tirs û belengaziyê bêpar e))

Xala 3. ya vê danezanê dibêje: "Mafê her kesî ye jiyan, azadî û ewlehiya kesane.

Di sala 1949an de, çar peymanên Cinêvê hatin îmzekirin, bi taybetî peymanê çaremîn, ku tê de tekezî li ser pêwîstiya parastina sivîlan di dema şer de kir, çi rewşa şer ji aliyê ti aliyên şer ve hatibe naskirin yan na.

Her wiha li ser gelek belgeyên navneteweyî jî li hev kirin û ji aliyê welatên cîhanê ve hatin îmzekirin, ji wan:

Di sala 1993an de, peymanê Qedexkirina Pêşkeftin, Hilberandin, Depokirin û Bikaranîna Çekên Kîmyayî û Têkbirina Wan.

Di sala 1998an de, Peymana Roma ya Dadgeha Cezayên Navneteweyî hat îmzekirin, ku tê de sûcên: ((komkujî - sûcên li dijî mirovahiyê - tawanên şer - sûcê destdirêjîyê)) û zelalkirina stûnên wê û organîzekirina darizandina dadwerî ya sûcdarên van tawan, bi taybetî kesayetên ku fermanên pêkanîna van tawan derdixin.

Belê... Tevî ku di belgeyên yasayî yên navneteweyî de di warê pêşvebirina mafên mirovan de û pêwîstiya dewlet û hikûmetên ji bo parastina van mafan , û sûcdarkirina wan ji bo cûrbecûr bînpêkirinên li dijî wan mafan, çi mafên kesane û çi Mafên gelan, tawan û hovîtiyên li dijî gelên herêmê hema kêliyêkê ranwestiyane , ne berî û ne piştî dîrok û derbasbûna van yasayan.

Rejîma desthilatdar a dewleta Tirk sûcê êrîşên li dijî Sûriyeyê, qirkirin, sûcên şer û sûcên li dijî mirovahiyê kiriye.

Sûcên dewleta Tirk li ser asta dagirkirina xakê, kuştina mirovan, koçberkirina bi darê zorê û guhertina demografiya herêmê nesekinî, ji wêdetir êrîşî xweza û mîrateyên dîrokî yên herêmên dagirkirî kir. û artêşa Tirk ji bo bikaranîna çekên kîmyewî yên qedexekirî dudilî nebû.

rojane sivîlên ewle, mal û navendên sivîlan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hawan, top, çekên doçka û balafirên keşfê hedef digire , Têbînî ku deverên me gelek kampên

awareyên ji deverên din dihewîne, ku ev yek gefê li rewşa mirovî ya nişteciyên wan kampan dike. u hejmara sivîlên ku jiyana xwe ji dest dane ji destpêka vê salê de 122 ye , û hejmara birîndaran 173 ye , û tenê li Efrînê. Hejmara sivîlên ku jiyana xwe ji dest dane 24 û hejmara revandinê jî 380 ye. Di derbarê darên zeytûnan de jî zêdetirî 400 dar hatin birîn, hilkirin û şewitandin û 8 bajarok hatin avakirin.

Dewleta Tirk sûcên xwe li ber çav û guhên cîhanê pêk tîne, ku li hember tiştên ku diqewimin bêdeng e û ji vê zêdetir dewleta Tirk destûr girtiye ji Rusya ku qanûnên navneteweyî bînpê bike û êrîşên xwe yên li dijî gelên Sûriyeyê pêk bîne.

Û ya ku êşê zêdetir dike ew e ku destekdayina Tirkiyê ji terorîzmê di dema borî û niha de bûye eşkere û hemû cîhan jî vê yekê dizane, lê heta niha ti helwestek yasayî ya navdewletî li hember vî welatî û rejîma serdest a wî welatî nehatiye standin .

Recep Tayyîp Erdogan ji sûcên artêşa Tirk û Komên çekdar ên girêdayî dewleta Tirk, berpirsyariya hiqûqî ya sizayî û ya medenî hildigre.

Bi rêya daxuyaniya xwe em bang dikin:

1-Gelên cîhana azad bi rêya saziyên civaka sivîl, bi taybetî saziyên ku bi mafên mirovan re têkildar in, ji bo piştgiriya gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin û zextê li hikûmetên welatên xwe bikin da ku helwestên cidî li hember tawanên ku Dewleta Tirk li dijî herêmên me kiriye .

2-Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Federasyona Rûsyayê garantorên du peymanên agirbestê yên di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk û dewleta Tirk ên sala 2019an de. Da ku erkên xwe yên ji van herdu peymanan pêk bînin û zextê li dewleta Tirk bikin ku êrîşên xwe rawestîne.

3-Civata Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî, ku bi erkê parastina aştî û ewlekarîya navdewletî ye, bi lez û bez li gor Beşa 7an ya Peymana Neteweyên Yekgirtî tevdigere, da ku tedbîrên pêwîst bigire da ku ewlekarî û aramî li herêmên me de pêkbîne , bi dawî anîna dagirkeriyê û vegerandina koçberan bo malên wan.

4-kerîm xan Kiyosî , Serdozgerê Dadgeha Cezayên ya Navneteweyî, ji bo ku bersivê bide banga edaletê û ji bo destpêkirina dozê giştî li dijî Serokomarê Komara Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan û Wezîrê Parastinê yê Tirkiyê Xelusî Akar û li dijî hemû kesên ku tê îspatkirin ku beşdarî tawanên li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûne.

Qamişlo 23-23-2022

Rêxistinên Mafên Mirovan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê (El.Cezîrê – El.Ferat – Efrîn)

Yekîtiya Parêzeran li Bakur û Rojhilatê Sûriyê